Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :975 | 29-Hezîran- 2022 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165

# Muzexaneya Seîd ji Berdereşê re

**Çîroka hema hema her parçeyê di muzexaneya li Berdereşê heye. Seîd Beranî tiştên tê de di 31 salan de berhev kirine. Sermeselê cotek pêlavên jinan hene. Zilamekî ji Berdereşê beriya bi 80 salan hezar kîlometre rê çûye û ew cot ji dergistiya xwe re aniye.**

Li Kurdistanê gelek kes hene ku tişt û alavên jiyana rojane, amûrên kar ên gundewariyê yên berê, cilûbergên gelêrî, mehfûr û berên bi desta çêkirî berhev dikin. Gelekan ji wan nexasim li Rojava û Başûrê Kurdistanê bi awayî li nava mala xwe tiştekî weke muzexaneyê çêkiriye.

Seîd Beranî jî yek ji wan e. Ev bêhtirî 31 salan e ku ew tişt, alav û cilûbergan berhev dike. Li mala xwe ya li Berdereşa Dihikê ew van tiştan muhafeze dike. Pirraniya wan dikarin weke mîrasa çandî ya civaka Kurd a gundewarî bên dîtin. Seîd Beranî heta niha qederê



hezar parçeyî li mala xwe dane hev.

Serê pêşî tenê nava mala wî hebû ji van tiştan. Ji ber wê yekê wî mala xwe veguherand muzexaneyekê. Niha ew li aliyekî piçûk ê Navenda Ciwanan û Sporê ya Berdereşê van parçeyên ji mîrasa çandî diparêze.

Seîd Beranî timî hez ji mîrasa çandî ya Kurdan kiriye. Ew heyranê van tiştan bûye. Gava sala 1976´an diçe serdana muzexaneya Mûsilê. Ha hingê jî ev fikra ku van tişt û alavan mîrasa çandî bide hev, pêre peyda bûye.

### Enfalê û globalbûn bûne sedem

Axir ew dibêje, du sedemên sereke hebûn ku kirine ew xwe bide ber vî barî. Ya yekê bipêşketina bi lez a teknolojiyê û globalbûnê kirine ku tişt û alavên senhetkaran çêdikirin, bi lez ji holê rabin. Yên ku man jî, gelekî guherîne.

Sedema duyem jî qirkirina Kurdan bi destê Sedam Hiseyn bûye. Lewma di dema enfalkirina Kurdan de gelek gundên Kurdistanê hatin xirakirin û gelek kêm tişt ji wan filitîn. Axir li qederê 100 gundên li hawîrdora Berdereşê gelek alav, amûr û tişt hebûne.

### Piştî Raperînê keysa xwe lê aniye

Piştî Raperîna 1991´ê, Seîd Beranî kar kir û dest bi berhevkirina tişt, alav û amûrên çandî yên jiyana gundewarî yên Kurdan kir. Wî her wiha hewl da cihekî ji bo parastina wan jî peyda bike.

Wî berê xwe dida gundan da ku van tiştan peyda bike, tiştên ku gundiyan êdî bi kar nedianîn.

Di nava tiştên li muzexaneya Seîd Beranî de bazinekî 149 salî jî heye.

### Ji wî serî dinyayê aniye

Hema hema her tişta li muzexayeê, çîroka wê bi xwe heye. Sermeselê cotek pêlavên jinan ên ji beriya 80 salan hene. Mêrekî ji Berdereşê hezar kîlometre rê çûye, da ku vî cotê pêlavan ji dergistiya xwe re bikirre.

Yanî bi gotinên zemanan, çûye wî serî dinyayê û ji dergistiya xwe re cotek pêlav kirriye.

Destar, cilûbergên gelêrî, merş, berr, mehfûr, kûz, dîzik, vazoyên kevin, firaxên midbex û navmalê, alav û amûrên çandiniyê û xwedîkirina pez û xelek xemlên mirovan û malan… Qederê hezar parçeyên li muzexaneya Seîd Beranî ji van tiştan pêk tên. **-Ozgurpolitika**

# Wan Ji Şanoyê Re Hazir e

**Şanovan xwe ji Mîhrîcana Şanoyê ya 3'yan a ji 23´yê Îlonê heta 30'ê Îlonê re amade dike.**

Li Wanê Şanovan ji sala 2017'an ve xebatên xwe dike û wê di navbera 23-30'ê Îlonê de bi dirûşmeya "Ew roj wê hilê, ew bihar wê bê" cara 3'yan Mihrîcana Şanoyê pêk bîne. Ji Mihrîcana li ser dika Şanovan ya li Perîhan AVM´ê ya li navçeya Îpekyolu ya Wanê 8 rojan wê dewam bike, amadekarî hatin destpêkirin. Di mihrîcanê de 10 lîstik wê bên nîşandan.

Mihrîcan wê bi lîstika "Jiyan, ji te pirr hez dikim (Hayat Seni Çok seviyorum) dest pê bike. Nivîskar-helbestvan Îlhan Samî Çomak ê 28 sal in di girtîgehê de ev lîstik



nivîsandiye. "Hey lo, dîsa tev li hev bû" ya ŞanoWanê bi dawî bibe. Lîstikvana ŞanoWanê Bêrîvan Bûdakbeyoglû, yek ji 4 kesan e ku xebatên mîihrîcanê bi rê ve dibin. Bêrîvan Bûdakbeyoglûyê xwest hem beşdar û hem jî temaşevan bi cilûbergên herêmî tev li roja destpêkê ya mihrîcanê bibin. Bêrîvan Bûdakbeyoglûyê got, lîstikeke din a giring ku dê di mihrîcanê de were lîstin, lîstika "Jineke hişyar dibe" ye: "Ev lîstik di rastiyê de dê di warê cih û pozîsyona jinê ya civakê de diyarker be. Lîstikeke serkeftî û xweş e."

Wê bang li her kesî kir ku tev li mihrîcanê bibe. -***Ozgurpolitika***

### Sudoku:Pirs 8

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | 3 | | | | | 2 |
| | | 8 | | 2 | | 3 | | 4 |
| 1 | 3 | | | | 7 | 9 | | |
| 8 | | | | 3 | | | | |
| | 9 | 4 | 6 | | 2 | 8 | 1 | |
| | | | | 4 | | | | 3 |
| | | 3 | 9 | | | | 8 | 7 |
| 6 | | 5 | | 8 | | 4 | | |
| 4 | | | | | 5 | | | |


### Sudoku: Bersiv7

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 3 | 4 | 6 | 5 | 9 | 8 | 2 | 7 | 1 |
| 5 | 1 | 8 | 2 | 3 | 7 | 9 | 4 | 6 |
| 2 | 9 | 7 | 6 | 1 | 4 | 3 | 8 | 5 |
| 8 | 5 | 1 | 4 | 6 | 9 | 7 | 3 | 2 |
| 9 | 7 | 3 | 8 | 5 | 2 | 1 | 6 | 4 |
| 4 | 6 | 2 | 3 | 7 | 1 | 5 | 9 | 8 |
| 7 | 3 | 5 | 1 | 8 | 6 | 4 | 2 | 9 |
| 6 | 2 | 9 | 7 | 4 | 5 | 8 | 1 | 3 |
| 1 | 8 | 4 | 9 | 2 | 3 | 6 | 5 | 7 |

### Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | ■ | J | A | L | E | ■ | E | ■ | A |
| 2 | D | Î | R | ■ | Q | O | S | E | R |
| 3 | R | ■ | D | A | D | ■ | M | ■ | D |
| 4 | A | W | I | R | ■ | C | E | H | ■ |
| 5 | M | ■ | K | A | M | A | R | O | T |
| 6 | ■ | Î | ■ | V | Î | N | ■ | R | E |
| 7 | A | R | Î | ■ | N | ■ | Ş | Î | N |
| 8 | L | O | ■ | N | A | M | E | ■ | Û |
| 9 | A | ■ | M | A | K | ■ | Ş | Ê | R |

### Xaçepirs



#### ÇEP-RAST

1. Hespa mê
2. Notayek… Xwîşkên bûk û zavê… Xanedana qraliyeta Vîetnamê
3. Dema mirov nameyê ji postaxaneyê dişîne li ser zerfê dixe… Kesê ne mirî
4. Wekî gijbûna pirça canê ajelan û tiştên wisa… Alî
5. Kesê ku rê nîşan dide
6. Zadê ku piranî ji bo xwedîkirina sewalan tê çandin… Tevahiya hêzên leşkerî yên dewleteke
7. Ji bo tiştê ku navê wan nayê bîra mirov an jî mirov naxwaze bi nav bike (Bi taybetî li herêma Mêrdînê tê gotin)
8. Ê ku ji ber tirs, heyecan û wekî wan reng diavêjin
9. Tûj… Ew nîjada spî ya ku tê bawerkirin ji kurê Hz. Nûh Sam peyde bûne; wekî kesê ku bi erebî, îbranî, asûrî û hebeşî diaxivin

#### JOR-JÊR

1. Kanaleke televîzyonê ya muzîkê ya kurdî… Kurteya elementa Aktînyûmê… Rojek
2. Di zimanê zarokan de lêxistin
3. Xwe parastina xwe ji hin xwarin û vexwarinan
4. Hezkiriya Derwêşê Evdî… Şexs
5. Pêşgireke lêkerçêker e û wateya berbijoriyê didê… Tevgera hewayê… Yezdanekî misrî
6. Kar û xebat… Tiriyê negihiştî
7. Bajarekî me… Pirsek di rewşa ne tewandî de
8. Bêzar û bêziman… Ji vir û şûnde, ji niha pê de
9. Di zimanê zarokan de tiştê pîs û kirêt… Cihê herandinê… Peyva neyînî

# Têkoşîna jina Kurd ji nivîskaran re bûye ilham

Nivîskarê Morîtanî yê ciwan Mihemed Elemîn, diyar kir ku jina Kurd sembola jiyana Azad e û got, ti hevok nikarin lehengiya jina Kurd ya Ku ji kaniya fikrê Rêber Apo vexwariyê, şîrove bike. ***R-7***



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 998 | 21-Îlon- 2022 | www.ronahi.net/ku/

# 'XWEDÎDERKETINA LI JÎNA EMÎNÎ ÇIRÛSKA ŞOREŞEKE NÛ YE'



## Fermandara YPJ'ê : Em bi hemû hêza xwe ve li kêleka jinên çalakvan yên Îranê ne



Têkildarê qetilkirina jina Kurd ya bi navê Jîna Emînî, Endama Fermandariya Giştî ya YPJ'ê Rohilat Efrîn diyar kir ku, rêjîma Îranê nikara hêz û zanista jinê bi cilên reş wenda bike û got, em bi hemû hêza xwe ve li kêleka serhildanên jinên li Îranê ne. ***R-2***

## Rûken: Îran wê bi têkoşîna azadiyê ya jinan azad bibe

Zerîn Rûken diyar kir ku rejîma Îranê bi êrîşa li dijî hêviya azadiyê ya jinan hewl dide ku mejî û ruhê wan teslîm bigire û got, wê azadî bi hêza rêxistinî ya jinan bê Îranê.***R-4***

## Li Rojhilatê Kurdistanê di xwepêşandanan de 5 kes hatin qetilkirin



Xwepêşandanên ji bo şermezarkirina Kuştina Jîna Emînî ku li Rojhilatê Kurdistanê daketin kolanan, rastî êrişên hêzên dewleta Îranê hatin û di encamê de 5 kes hatin qetilkirin. ***R-3***


## `Parastina paqijiya bajar erka her kesî ye`



Berpirsê Beşa Paqijiyê li bajarê Qamişlo Mihdî Itêl got, bi armanca belavkirina çanda paqijiyê di nava gel de, em her demê bi pêngavên paqijiyê radibin. Heriwiha da zanîn ku pêngava paqijiya ya ku berî sê heyvan pê ve rabûn, ancamên baş da. ***R-6***



DILYAR CIZÎRÎ
Ji bo tinekirina DAIŞ'ê.........
*R-4*



Zozan CIZÎRÎ
Perwerdeya Civaka Demokratîk hîmê jiyana azad e
*R-2*



Dijwar Ehmed Axa
Zimanê Dayikê...
*R-6*

Zekî Bedran
Erdogan, ji bo Kurdan li cihanê digere
*R-5*

# Fermandara YPJ'ê : Em bi hemû hêza xwe ve li kêleka jinên çalakvan yên Îranê ne

Têkildarê qetilkirina jina Kurd ya bi navê Jîna Amînî, Endama Fermandariya Giştî ya YPJ'ê Rohilat Efrîn diyar kir ku, rêjîma Îranê nikara hêz û zanista jinê bi cilên reş wenda bike û got, em bi hemû hêza xwe ve li kêleka serhildanên jinên li Îranê ne.

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**

Ji bo qirkirin û şkandina vîn û hêza jinê, hêzên serdest polîtîkeyên herî qirêj li dijî jinê, didin meşandin. Yek ji wan, keça ciwan ya Kurd Jîna Emînî(22) ye. 13'ê Îlonê li Tehranê dema Jîna Amînî dixwaze biçe mala xwe, bi bahaneya ku hinek pora wê di bin şarpê de derketiye, polisan xwast wê binçav bigrin. Lê, ji ber ku wê ew nêzîkatiya wan qebûl nekir, polisan bi şîddet û îşkence ew dîl girt. 3 rojan binçavkirî di bin îşkence û tûndiya polîsan de ma. Piştî 3 rojan ji ber birînên xwe li nexweşxaneya Tahranê jiyana xwe ji dest da.

Li dijî kuştina Jîna Amînî, li seranserê cîhanê û Rojhilatê Kurdistanê çalakiyên cuda hatin li dar xistin. Beşek ji partî, rêxistinên sivîl, kesayetên siyasî û civakî yên rojhilatê Kurdistanê, li dijî qetilkirina jina ciwan ya Kurd Jîna Amînî, dest bi greva giştî kirin.

Li ser mijarê Endama Fermandariya Giştî ya Yekêneyên Parastina Jin (YPJ) Rohilat Efrîn, ji rojnameya me re axivî û wiha bersiva pirsên me da.

**Hûn sîstema rêjîma Îranê û hiquqa wê ya li ser jinê çawa dinerxênin?**

Sîstema Îranê bi taybet di derheqê jinê de, sêstemeke li ser zihniyeta zilamê serdest, hatiya avakirin. Polîtîka Îran'ê ya li hember jinê ku qaşo bi navê mafê parastina jinê bi nav dike, înkarkirina ziman, çand û hêza jinê ye. Li Îranê beramberî zanist û sekna jinê, ti maf jê re wezaretê wî hene, yê herî jêr gel e û yên herî kole jî, jin in. Ev rastî ne ji îro de, ji dîrokê de heta roja me ya îro, mirov dikare bêje di sîstema îranê de huqukekê ku jin wek îrade bê dîtin û bê parastin tine ye.

**Çima di dîraka Îranê de sîstema wê her tim li dîjî azadiya jinê ye û şîddetekê pir alî li ser jinê heye. Ango polîtikaya wê ya li dijî jinê pir teybete, çima?**

Di dîroka Îranê de, beriya sala 1979`an de di şoreşên Rojhilatê Kurdistanê de, serhildanên gel yên li dijî dîktatorî de, jin xwedî hêz û rolekî pir girîng bû; di serhildanan de dibûn pêşeng û li hember dîktatoriyê, serê xwe bilind dikir. Herwiha jin parizvana ziman, çand û dîroka xwe bû. Lewma jina kurd ya tekoşer, her tim di nava komara Îranê de xofekê çê dike. Ne tenê Îran, li her devera ku jina kurd serê xwe li hember dijmin bilind dike, tirsê di dilê hêzên serdets de çêdike. Ne tine jinên kurd jinên beluc, yên azerî yên faris xwe ji aliyê zanistê pêş xistiye. Rastiya zilamê serdest, rastiya komera Îranê lêkolin kirîne û vê sîstemê nas dikin. Herwiha seknek wan ya zanist li hember vê sîstemê heye. Di dirokê de jî em dibînin ku yê her tim di serhildan û şoreşa de pêşengîkirî jin e.

Lewma niha jî di sîstema Îranê de, yên ku her tim rastî îşkenceyê tên jin in, ji ber ku yê ku dikare azadiyê bidest bixe û gel ji dîktatoran rizgar



Îran dizane ku li hember komera îranê ya faşîst, hêza ku siyasetekê alternatîf biparêze û civakê bi xwe re azad bike jin e. lewma jin jî her tim di hedefa wê de ye.



nehatine dayîn. Lewra em nikarin bêjin ku di Îranê de maf û parastina jinê heye. Ji ber ku di Sîstema Îran de jin wek îrade nayê qebûlkirin û mirov dikare sîstema wê wiha pênase bike: Destpêkê qanûna Ayetulah Xaminayî tên di jêr de jî bike jî, jin e.

Ev yek dibe sedem ku Îran û tevayîya hêzên serdest, ji hêza jinan bi taybetî jina Kurd, bitirsin. Ji bow ê rejîma îranê di bin nave ehleq de bêehleqiya herî mezin dike û ji her alî ve jinê dike hedef.

**Di vê pêvajoyê de hinek serhildan û nerazîbûnê gel û jinan li dijî rejîma Îranê ya faşîst derketin, li hember van nerazîbûna, rejîma Îranê kete nava tirseke mezin û êrişî çalekvanan kir û teybet jî êriş û zextên li ser jina Kurd zêde kirin. Sedemê vê panika rejîmê çiye, çima teybet jina kurd dike hedef li ser qanunên xwe yên di bin navê namusê de?**


Hikumeta Îranê ji bo gel bike kolê xwe, siyaseta birçîbûnê dide meşandin, ta ku gel biçe ber wan û serî xwe bitewîne. Li hember vê siyasetê, nêzî 2 salane gelê rojhilatê Kurdistanê bi pêşengtiya jinê bi serhiladana, nerazîbûnên xwe nîşan didan. Ev serhildan tirseke pir mezin di hindirê rejima Îranê de çêkir. Lewra êrişî gel dikir û dixwest lezûbez dengê gel qut bike. Her tim li Îranê, li ku derê qêrînek çêdibe, rejîm bi êrişê û sêstema xwe qirêj, tevdigereç bi vî şêvazî Îran di bin navê qanûna şerîetê de, di bin navê namûsê de, bi sedan jin kuştine. Lewra yê ku dikare vê civakê ji koletiya rejimê rizgar bike jine, bi taybet jina kurd e. Ev jî dibe sedem ku jin bibe hedefa rejimê û hemû hêzên serdest.

**Jinên Rojhilatê Kurdistanê li dijî Kuştina Jîna Emînî daketin qadan û şerpeyên xwe şewitandin porê xwe qut kirin. Li ser van bertekan hûn wek hêza Şoreşa Rojava van bertekan di kîjan astê de dibînin?**

Jîna Emînî jî, nimûneyeke ji jinên ku li ser destê rejimê hatine kuştin e. Bi armanca xwedîderketin li xwîna Jîna, jinên rojhilatê Kurdistanê ji bo kuştina Jîna Emînî careke din dadikevin qadan û ji dîktatoriyê re, ji rejima Îslamî re dibêjin êdî bes e. Ev xwedîderketin parastina bingeha şoreşê ye. Çalakiya ku jinên rojhilatê Kurdistanê pê rabûn mirov dikare wek çirûska şoreşeke bi pêşengtiya jinê, binav bike. Li Xwedîderketina jina kurd Jîna Emînî û dikare bibe sedema despêkirina şoreşa rojhilatê Kurdistanê. Çimkî derketin kolana û rakirina şerpeyan û şewtandina wê, şewtandina mejiyê zilamê serdest e. Di çalakiyên bi vî rengî mirov yekparbûna rihê jin dibîne. Eger jin bi yek dengî bi yek rihî li hev xwedî derkevin, bê guman wê bi azadî bi ser kevin.

**Wek YPJ`ê helwesta we ya li hemberî kiryarên rejima Îranê ya li dijî jinê çiye û bangewaziya we ya ji bo çalakvanên tekoşîn çiye?**

Di rewşeke wiha de ji bo her çar perçeyên Kurdistanê, herwiha ji bo tevayîya jinên cîhanê banga me ewe ku, xwe birêxistin kirin û xwe parastin, pir girîn û pêwîst e. Divê em ti carî teslîm nebin. Çawa em êşa xwe bi hev re par vedikin, divê gavên me yên ji bo azadiyê jî, bi hev re bin. **Em wek YPJ'ê di şexsê jina kurd Jîna Emînî de, bi hemû hêza xwe ve li kêleka jinên çalakvan bin.** Em di wê baweriyê de ne ku wê şoreşeke din, bi rengê jina Kurdistanê wê çê bibe. Em jî wek hêzeke jin, bi fikir û hizrên xwe bi hemû jinên têkoşer re ne û wan silav dikin.



**Perwerdeya Civaka Demokratîk hîmê jiyana azad e**

Zozan CIZÎRÎ

Roja îro ji bo her gelekê xebata herî girîng û bingehîn a nirxên dîroka civakî radestî nifşên nû bike, her wisa mayînde û domdar bike, perwerde ye.

Şoreşa Rojavayê Kurdistanê ku wek çirûska azadiyê bi 19'ê Tîrmeha 2012'ê re mohra xwe li dîroka gelên Bakur-Rojhilatê Sûriyê xist, bi hişmendiya avakirina civakeke demokratîkxweser derî li rêbazeke nû ya perwerdeya pir-zimanî û pir çandî vekir. Di dîroka Sûriyê de sala 1963'yê ango li ser dewra Hizba Baas di dibistanan de xwendina bi zimanê Kurdî hatibû qedexekirin, bi ser de kesên zimanê kurdî fêr dikirin jî, dihatin girtin. Rexmê gelek zext û astengkirinên Rejîma Baas jî, zana û rewşenbîrên Kurd ên wekî Seydayê Cegerxwîn, Osman Sebrî û hwd. xebatên xwe yên Kurdperwer bi israr domandin, ji nifşên me yên nû re gelek berhemên nivîskî-wêjeyî yên giranbuha hiştin. Gelê Rojavayê Kurdistanê yê bi hesreta azadî û demokrasiyê li dor bîrdoziya Rêber APO kom bûyî, tu caran dev hêviya azadiyê berneda. Lewre gava firsenda Şoreşa 19'ê Tîrmehê bi dest xist, bi hemû hêz û hebûna xwe gaveke dîrokî di warê pêşxistina sîstema perwerdeya civaka demokratîk de avêt. Piştî ked û xebata salan, bi taybetî Saziya Zimanê Kurdî ya Rojavayê Kurdistanê sala 2014'ê biryar girt ku, li dibistanên herêmên Xweseriya Demokratîk perwerdeya bi zimanê kurdî bidin. Wek berdewamiya vê xebata girîng, sala perwerdê ya 2015-2016'ê bernameya perwerdeya dibistanan fetilandin perwerdeya pir-zimanî. Vê gavê bala gelek dewrûberan kişand. Ji ber ku vê sîstema perwerdê ya nûjen, têgihîştina ku tevahî gel û pêkhateyên dikevin bin berpirsiyariya Rêveberiya Xweser, di dibistanan de girîngiyê bidin perwerdeya zimanê dayîkê, pêş xist. Di serî de Kurd, Asûrî-Sûryan her pêkhateyeke gelan dest bi xebata zimanê dayîkê kirin. Armanc ji vê ew bû ku, di serî de Sûriye, li giştî cîhanê êdî tu zimanek neyê windakirin, tu zimanek bi hişmendiya desthilatdariyê neyê bişaftin û înkarkirin. Li ser vê bingehê nimûneyek bê afirandin ku, her kes bibîne naskirina dewlemendiya pir-çandî û pirzimanî ya gelan sînorê tu welatekê xira nake; berevajî nakokiyan ji holê radike û aştiya civakî pêk tîne. Dema ev gava perwerdeya pir-zimanî li Rojavayê Kurdistanê hat destpêkirin, hinek dewrûberên ne razî, propagandayên ku "êdî Sûriye parçe dibe" belav kirin. Lê ji wê rojê heya niha -vaye îro jî dibistanên Bakur-Rojhilatê Sûriyê bi heman sîstema perwerdeya civaka demokratîk, hem jî bi asteke bilind ji dibistana dayîkê heta zanîngehan deriyê xwe ji bo sala perwerdê ya 2022-2023'yê vekir- vê rêbaza perwerdê bihêle Sûriyê parçe bike, hevgirtina gelên herêmê xurtir kiriye. Di encama vê pratîka berçav û serkeftî de pêwîste êdî rayedarên dewleta Sûriyê jî qenaet bi çareseriya Rêveberiya Xweser a Bakur-Rojhilatê Sûriyê bînin ku, meydan ji dewleta Tirk a dagirker-şerxwaz û çeteyên wê re nemîne. Îro li Bakur-Rojhilatê Sûriyê ev sîstema perwerdê ya nûjen bi navê tevahî gelên herêmê destkeftî û qezencek herî mezin e. Bi taybetî ji bo me Kurdan ev pêkhatina xewna dehê salan e. Elbet di destpêka vê xebata birûmet û netewî de bi sedan mamosteyên Kurd, Ereb, AsûrîSûryan ên welatparêz ked û berdêlên giranbuha dan. Ji mamosteyên Şoreşa Rojava şehîd Viyan Amara, Egîd Cîlo, Zozan Yûsif, Gulîstan Hesen, Rodî Hesen û Perwîn Hemo bûne pêşengên vê pêngava dîrokî ku, bi hêviyek mezin li rêza pêş cih girtin. Lewre her dayîk û bavekî li vê herêmê pêwîste qîmeta vê keda mamoste û kedkarên perwerdê yên destpêka Şoreşê bizanin, bi wê coş, heyecan û şanaziya destpêkê berê zarokên xwe bidin dibistanên xwe.



# Têkoşîna jina Kurd ji nivîskaran re bûye ilham

Nivîskarê Morîtanî yê ciwan Mihemed Elemîn, diyar kir ku jina Kurd sembola jiyana Azad e û got, ti hevok nikarin lehengiya jina Kurd ya Ku ji kaniya fikrê Rêber Apo vexwariyê, şîrove bike.

**Mihemed Xanim / Qamişlo**

Di dîroka hezarê salan ya gelê Kurd de, jinên Kurd yên ku pêşengî ji gel re kirine hene. Gelek ji wan bûne xet û sonda serketinê ya ji bo azadiyê. Herwiha di her serhildana civakî û siyasî de jinan cih girtiye û pêşengî kirine. Ev rêûresm di roja me de gihişt asta ku jinên azad li çiyayên Kurdistanê li hemberî artêşa dagîrkeriya tirk ku hêza duyêm ya NATO'ê ye, serkeftinên mezin bidest bixin û pêşengiya Şoreşa Rojava û ya jinên cîhanê bikin. Ev jinên têkoşer ji aliyê tevahî cîhanê ve weke mînak hatin dîtin. Bi dehan pirtûk û çîrok li ser lehengiya wan hatin nivîsandin.

Yek ji nivîskarên ku ilhama xwe ji lehengiya jina Kurd girtiye û çîroka pêşengekê ji pêşengên şoreşa Rojava nivîsandiyê, ciwanê Morîtanî Mihemed Alemîn e.

Mihemed Alemîn ji paytexta Morîtaniya, Newakşotê ye, ew di zanîngehê de başa wêje dixwîne, demeke dirêje ku nivîs û çîrokan ji bo rojnameyên Morîtanî dinvîse. Ji ber ku têkoşîna jina Kurd û bi taybet di şoreşa Rojava de bandoreke mezin li Mihemed kir, wî çîroka şehîd Barîn Kobanê nivîsand û di Rojnameya Elweten ya morîtanî de belav kir.

Derbarê nivîsandina Çîroka Şehîd Barîn Kobanê û bandora lehengiya jina Kurd, Ciwanê Morîtanî Mihemed Elemîn ji me re axivî.

Mihemed diyar kir ku wî destpêkê bi riya hevalekî xwe yê Kurd şoreşa Rojava nas kir û wiha got: "Destpêkê bi riya hevalekî xwe yê Kurd min hin tişt li ser şoreşa Rojava nas kirin. Pişt re min bi riya destgehên çapemeniyê yên tevgara Azadiya Kurdistanê, şoreşa Rojava, Felsefeya Rêber Apo û lehengiya jina Kurd jî, nas kir. Bi riya xwendina pirtûk û ajansên Kurdî, ez ketim kurahiya dîroka doza Kurd û Kurdistanê; min pêşeng, Têkoşer û berxwedêrên Kurdan nas kirin."

**'Jinên tekoşer yên li çiyayên Kurdistanê mînaka azadiyê ne'**

Tişta ku herî bala Mihemed kişandî, têkoşîna jinên Tevgera Azadiyê ya di Şoreşa Rojava de bû. Mihened wiha bal dikîşîne ser tekoşina azadiya jinê: "Çawa gelekî ku bi sedê salan zilm û zordarî li ser hatiyê kirin, di komkujiyan re derbas bûye, mafê jiyanê jê hatiyê stendin, zimanê wî qedexe bûye, dikare serî rake û dijminên xwe li ber lehiya têkoşînê bibe, ev rastiyeke û ev gel jî gelê Kurd e. Lê ya herî girîn ku banorekê mezin li mirovan dike, jina Kurd e. Ev jina ku dîrokekî wê ya dirêj bi têkoşînê re heye û jinên cîhanê hêza xwe ji têkoşîna wê girtin e. Jinên li çiyayên Kurdistanê ev zêdeyê 45 salane ku li hemberî dagîrkerên xaka xwe serî hildidin, bûne mînaka têkoşîna azadiya."

**'Jina Kurd pêşenga jinên azadîxwaz e'**

Mihemed diyar kir ku ti hevok nikarin têkoşîna jinên Kurd şîrove bikin û wiha got:"Ya ku mirov matmayî dihêle, çawa li deverêkê wekî Rojhilata Navîn, ku jin ji tevaiya mafên xwe bêpare û nasnameya wê tune ye, Jinên Kurd serî radikin û pêşengiya şoreşê dikin, dibin pêşengên jinên azadîxwaz yên cîhanê. Bi rastî mirov matmayî dimîne, tu hevok nikarin têkoşîna jina Kurd ya ku ji kaniya fikrê Rêber Ocelan vexwariye, şîrove bike. "

Dema ku Mihemed Elemîn Şoreşa Rojava dişopîne, ji gelê Kurd hez dike, fikr û felsefeya Rêber Apo ji nêz ve dixwîne. Ew fikrê Rêber Apo û Şoreşa Rojava, ji bo hevalên xwe yên zanîngehê şîrove dike.



Herwiha ew dixwaze serdana Rojava bike û di nava gelê têkoşer de hinek dem derbas bike.

Mihemed Emîn da xuyakirin ku jina Kurd sembola têkoşînê ye û axaftina xwe wiha qedand: "Jina kurd sembola têkoşîn û berxwedanê ye; sebmola azadî û bedweiyê ye. Pêşenga jinên cîhanê û ya nifşên nû ye. Dema min, çîroka Şehîd Barîn Kobanî nivîsand, min hîs dikir ez di nava gelê rojava de jiyan dikim. Her kesê ku çîroka Şehîd Barîn xwendî, xwest ji nêz ve Şoreşa Rojava nas bike. "

# Li bakur û rojhilatê Sûriyê perwerdeya yekê ya Bale

**Darîn Silê/Qamişlo**

**Desteya Çand û Hûnerê ya herêma Cizîrê, 18`ê vê heyvê li navenda Mihemed Şêxo ya bajarê Qamişlo 15 lîstokvanên bale yên zarok, ku di perwerdeya lîstoka bale de derbas bûne, xelat kirin.**

Lîstoka bale lîstokeke hesas, balkêş û bi sporê ve girêdayî ye. Kesê ku fêrî vê lîstokê dibe hem laşê wî nerim dibe, hem jî derûniya wî rehet dibe. Lê, heya niha ti caran perwerdeyên Bale li herêma bakur û rojhilatê Sûrî nehatine dayîn û ti kes fêrî lîstoka bale nebûye. Ji bo wê jî ev cara yekê ye ku li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê perwerdeya bale tê dayîn, ku tê de 15 zarokên law û keç hatin perwerdekirin û fêrî lîstoka bale bûn. Temenê Zarokên ku hatine perwerdekirin jî, ji 3 heta 14 salî ye. Derbarê perwerdeya Bale û awayê fêrkirina zarokan, mamosteya Bale û lîstokvanên ku di perwerdeyê de derbas bûne, ji me re axivîn.

**`Ez dixwazim bibim lîstokvaneke bale ya xurt`**

Lîstokvana bi navê Derbar Hekar Hesen ya 8 salî da zanîn ku ew pir ji lîstoka bale hes dike û axaftina xwe wiha domand: "Dema min



bihîst ku wê perwerdeyek bale bê dayîn, ez pir kêfxweş bûm. Lewra ti caran perwerdeyên bale li herêma me nehatine dayîn. Ji bo wê jî min xwest ez tevlî vê perwerdeyê bibim, da ku ez fêrî lîstoka bale bibim. Piştî ku ez di perwerdeyê de derbas bûm û fêr bûm, min hê zêdetir ji lîstoka bale hez kir."



Derbar Hekar Hesen di dawiyê de got, ez dixwazim di paşrojê de bibim lîstokvaneke bale ya xurt û zarokên weke xwe fêr bikim. Da



ku çanda lîstoka bale belav bibe û civak jî bi çavekî erênî meyze vê lîstikê bike.


**`Mirov bi xweşiya lîstokê hîs dike ku li dinyayeke din e`**

Lîstokvana bi navê Lana Seyîd Kano jî, diyar kir ku wê pir sûd ji perwerdeya bale girt û ev yek li axaftina xwe zêde kir: "Di perwerdeyê de ez fêrî gelek tevgerên laş bûm. Lewra lîstoka bale ji tevgerên laş pêk tê. Dema mirov fêrî van tevgeran dibe, di lîstokê de laşê wî sivik dibe. Berî ku ez fêr bibim, ev lîstok ji min re pir zehmet dihat. Lê, ne zehmet e û pir xweşe jî. Mirov bi xweşiya lîstokê hîs dike ku li dinyayeke din e."

Lana Seyîd Kano di dawiya axaftina xwe de got, ez bihêvîme perwerdeyên Bale zêdetir bibin, da ku her kesê ji vê lîstokê hez dike tevlî perwerdeyê bibe û fêrî bale bibe.

**`Perwerde pir baş û serkeftî bû`**

Mamosteya bale Nazik El Elî, bîr xist ku ev perwerdeya yekê ya bale li bakur û rojnilatê Sûriyê tê dayîn û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Ji bilî min ti mamosteyê bale li bakur û rojhilatê Sûriyê nîne. Ez li şamê dijîm, lê ji ber ku gelek zarok li Qamişlo xwestin ku ez wan fêrî bale bikim, ez hatim Qamişlo. Ji bo wê jî, min dest bi perwerdeyeke bale ya zarokan kir. Perwerde nêzî 15 rojan dewam kir. di perwerdeyê de zarok bi awayekî lez fêr bûn. min bawer nedikir ku wê zarok bi vê lezbûnê fêrî lîstoka bale bibin. Zarokên temenê wan 3 heta 5 salî, hê zêdetir û leztir fêr dibûn. Ji bo



wê jî perwerde pir baş û serkeftî derbas bû."

Nazik di berdewamiya axaftina xwe de got, zarokên ku laşê wan nerim bû, zû fêr dibûn û zehmetiyan di çêkirina tevgerên laş û lîstokê de nedidîtin. Lê yên din, hin zehmetî dikişandin heta ku fêr dibûn. Lê tevî ku demê perwerdeyê kêm bû jî, zarok baş fêr bûn.

Nazik li ser awayê fêrkirina zarokan jî wiha got: "Hin caran piştî ku me wane bi dawî dikir, min dîmenên lîstoka bale ji wan re rê dikir, da ku li mal jî meyze wê bikin û hê zêdetir fêr bibin û asta xwe pêş bixin."

**'Ez bihêvîme civaka me hunera bale baş nas bike'**

Mamosteya Bale Nazin El Elî, di dawiyê de destnîşan kir ku lîstoka bale hunereke bir xweşe û ji bo laş jî pir bi sûde. Ji bo wê jî, ez bihêvîme ku civaka me jî vê hunerê baş nas bike û rê li pêşiya zarokên xwe negrin.

# `Parastina paqijiya bajar erka her kesî ye`

Berpirsê Beşa Paqijiyê li bajarê Qamişlo Mihdî Itêl got, bi armanca belavkirina çanda paqijiyê di nava gel de, em her demê bi pêngavên paqijiyê radibin. Heriwiha da zanîn ku pêngava paqijiya ya ku berî sê heyvan pê ve rabûn, ancamên baş da.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Di destpêka şoreşa Rojava de, ji bo xizmeta gel li Qamişlo şaredarî hat avakirin. Tevî êrîşên dewleta Tirkî ya dagîrker jî, ji destpêkê heta roja îro şaredarî bênavber û bi rêxistinî xebata xwe didomîne. Şaredarî, li gorî imkan û pisporiya xwe projeyan amade dike û bi gelek pêngavan radibe. Yek ji pêngavên herî girîng ku pê ve radibe, pêngava Paqijiyê ye. Ji ber ku di dema dawî de gelek qirêj li nava bajar çêdibû, şaredariyê pêngavên ji bo parastina paqijiya bajar û jîngehê pêk anî, tê de jî gelek biroşûrên têkildarî baqijiyê li nava gel belav kir, da ku çanda paqijiyê di nava gel de belav bibe. Derbarê kontrolkirina rewşa paqijiyê li bajarê Qamişlo û pêngava ku berî sê heyvan şaredarî pê ve rabûbû, berpirsê Beşa Paqijiyê ya Şaredariya Gel li bajarê Qamişlo, Mihdî Itêl ji me re axivî.

**`Armanc ew e ku çanda paqijiyê di nava gel de balav bibe`**

Mihdî Itêl behsa pêngava Paqijiya ya ku berî sê heyvan pê ve rabûbûn kir û wiha got: "Di pêngavê de me gelek biroşûr li gel belav kirin. Di biroşûrê de jî hatibû diyarkirin ku kesê çopê biavêje nava kolanan û ser riyan wê ji aliyê şaredariyê were mûxalefekirin. Mûxalefe jî 25 hezar e. Armanca me ji pêngavê ew bû ku çand paqijiyê di nava gel bê belavkirin û parastina paqijiya bajar bê kirin. Ji bo wê jî piştê ku em bi vê pêngavê rabûn êdî baqijiya nava bajar baştir bûy û kemar jî kêm bûye. Li gorî şopandina me xuya dike ku ev pêngav encameke baş daye. Hê jî hin kes hene li paqijiyê ne baldarin, lê hêviyên me hene ku demên pêş de bi belavkirina çanda paqijiyê wê her kes li paqijiya derdorê baldar be."

Li gorî beşa zabîteyê ya şaredariya gel ya bajarê Qamişlo diyar bû ku di van 3 mehên dawî de 125 seza



yên paqijiyê hatin birîn.

**`Rojane bajêr tê paqijkirin`**

Mihdî da zanîn ku ew rojane kolanên nava bajêr û yên derve dişopînin û got, Nêzî 200 karkerên baqijiyê li şaredariyê hene. Ev karker rojane kolanên bajêr paqij dikin. Herwiha erebeyên çopê jî, li nava taxên bajêr digerin. Hefteyê 3 caran erebeyên çopê li nava kolanên taxan û rojane li kolanên sereke digerin. Danê sibehan erebe li nava taxan digerin û danê êvaran jî li nava kolanên bazarê digerin. Bi vî awayî rojane bajar bigiştî tê paqijkirin û gemar tê paqijkirin."

Mihdî bîr xist ku wan berî demekê gelek selikên çopê li nava bajar belav kirin û ev yek li axaftina xwe zêde kir: "Me li her taxê selik danîne. Li her taxê jî li gorî xwesteka gel selik hatin belavkirin. Herwiha li kolanên sereke jî me gelek selikin gemarê belav kirin. Hin deverên derdora bajarê Qamişlo hene pêwîstiya wan bi selikên çopê heye, emê hewl bidin li wan deveran jî selikan deynin. Lê li hindirê bajar bi giştî selik hatin belavkirin."

Mihdî bal kişand ser kesên ku çopa xwe datîn devê deriyên xwe û axaftina xwe wiha domand: "Kesên ku êvaran çopê datînin ber deriyên xwe û li hêviya erebeya




çopê dihêlin, bi şevê heywan wê çopê tev li kolanê belav dikin û ev dibe sedema ku qirêjî li nava bajêr çêbibe. Ji bo wê jî em bihêvîne ku her kes danê sibehan berî ku erebe li nava kolanan bigere çopa xwe amade bike, da ku dema erebe digere wê çopê kom bike."

**`Paqijî exlaq û çanda civakê ye`**

Mihdî da zanîn ku rola welatiyan di parastina paqijiya bajêr de pir girîng e û axaftina xwe wiha qedand: "Parastina paqijiya bajar erka her kesî ye. Pêngavên me tenê têra paqijiya bajar nake. Divê welatî bi me re alîkarbin. Çimkî yên ku li vî bajarî dijîn welatî ne. Jixwe ev pêngav ji bo paqijiya derdora wan tê kirin. Ji bo wê jî pêwîste em tev li paqijiya bajarê xwe xwedî derkevin. Paqijî exlaq û çanda civakê ye. Çawa ku welatê parastina paqijiya malên xwe dikin, divê di heman demê de parastina kolanên bajarê xwe jî bikin. Ji ber ku çareseriya paqijiyê di hevkariya gel de ye. Şaredarî çiqas paqijî bike jî, eger gel ne alîkar be paqijî çênabe û wê diyardeya avêtina çopê dewam bike."

## Tîr



**Zimanê Dayikê…**

Dijwar Ehmed Axa

Neviyekî min heye, navê wî Darvan e. Min ev navê Kurdî lê kiriye. Darvan sê salî ye, ji destpêka ku dest bi axaftina kir, bi Kurdî axivî, her çiqas malbatê û zarokên derdora xwestin erebî hîn bibe, lê wî nexwast hîn bibe. Bi dehê caran zarokên malê û hevjîna min, hewldan ku ji min re bêje "cido" yanî bi kurdî "Bapîr". Lê ewî zarokî li berxwe dida û ne digot cido dibêje, "kalko". Ji ber destpêka naskirina derdorê xwe, min ew fêrî Kurdî kir û min jêra got, ez kalkê te me, lewra ev gotin di mejyê wî de ma ye. Dema wê gotinê dibêje, çiqas bi min xweş û şêrîn e. Ti dibê qey mal û milkên vê dunyayê tev yên min in.

Îsal 59 sal in, ez bûme êsîrê zimanê erebî. Bê çawa êsîrek bi xîret û namûs êsîrtiyê bi rast û ruhnî qebûl nake, min jî zimanê erebî wek zimanê xwe qebûl nekir.

Rêjîmê, zimanê me li dibistanên seretayî qedexe kir, ne dihiştin ku zarokên me bi zimanê xwe bi axivin. Ne tenê di dibistanan de, heta dema navbera de jî mamoste darê wan di destên wan de bûn û dema gotinek kurdî dibhîstin, ji devê kê derketiba wî/wê lêdanek pir giran û dijwar, dixwar.

Bi sedan zarokên Kurdan dev ji xwendinê berdan, ji ber ku mamosteyên ereb li wan didan û xwendin li ber çavên wan reş dikirin. Yên ku diman jî, pirê wan nezan diman û ti sûd jê ne digirtin. Digihan refa 12'an lê, hîn jî rêziman ji hev dernedixistin. Wekî beşên bîrkarî jî baş fêr nedibûn, ji ber ku mamosteyan xwe bi wan re nediwestand. Ji ber ku ew ne zarokên wan bûn, ew ji aliyê rejîmê hatibûn fêrkirin ku ew zarokên dijminên wa ne.

Baş tê bîra min di salên 1983 heya 1993'an, min mamostetî li gundan dikir. Dema min hîn "wane" didan û bi taybet refên yekê, min li ser depê reng çêdikirin û ji zarokan dipirsî: ev çi renge? Teva bi hevre û bi dengekî pir xweş û şêrîn digotin: Ev kesk e, ev sor e, ev zer e. Raste wan zarokan rast digot lê, divê min ew fêrî zimanê biyanî(Erebî) kiriban e. Lewra, min ji wan re digot: 'Na, exder, ehmer, esfe. Di heman demê de agir bi dilê min diket. Lê, çi bikim zimanê me qedexe bû, em bindest bûn.

Ez ne li dijî fêrkirna zarokan ya çend zimanan im, lê dive zarok di serî de zimanê xwe yê zikmakî (Dayikê) fêr bibe.

Dê ka em niha li rewşa xwe ya Kurdan binêrin. Li her çar perçên Kurdistanê û bi taybet li Rojava ku em lê dijîn. Gelo em li zimanê Dayika xwe xwedî derketin e, an na? Divê em hemû vê pirsê li xwe bikin. Çend ji me zimanê xwe xwendine û heya astekê xwe pêş xwasti ye? Di baweriya min de, Jimar pir kêm e.

Mixabin em bi vê gotinê têşin lê, ev rastiyeke; me zimanê desthilatdara ji xwe re kire zimanê fermî. Heyf, em li zimanê xwe yê dewlemend û kevnar xwedî dernakevin! Ziman, ne tenê axaftine. Ziman rûmet, nasname, hebûn û rastiya me ye.

Divê em li rastiya xwe vegerin û xwe fêrî zimanê xwe bikin. Derfet di destê me de hene. Her kes dikare di rojê de seetekê ji bona hînbûna zimanê xwe veqetîne, ev ne pir zehmet e. Dibistanên kurdî, peymangeh hatine vekirin; mamoste hene, zanîngeh hatine damezrandin. Êdî bese, gerek her kesê bêje ez Kurdim, divê bizanibe bi kurdî bixwîn e û binivîsine.

# Şengal Ji Nû De Şîn û Ava Dibe

Xelkê gundê Sîba Şêx Xidir ê Şengalê bi avakirina malên xwe, warê xwe ji nû de şîn û ava dikin. Her wiha didin diyakirin ku warê wan tenê bi vegera gel xweş dibe û jiyan lê divegere.

Ruxmê pilan,êrîş û Siyaseta derekî ya liser civaka Êzidî, lê gelê Şengalê li ser avakirina warên xwe berdewamin. Xelkê Sîba Şêx Xidir ê Şengalê ku vegeriyane ser malên xwe, careka din xaniyên xwe ku ji aliyê DAIŞ'ê ve hatine xirakirin avadikin. Ev demeka malên vegeriyane bi keda xwe û alîkariya hin rêxistinên mirovî jiyanê li warê xwe vedigerînin.

Piştî êrîşa çeteyên DAIŞ'ê li ser Şengalê, di nehede zêdetir ji 40



malbat vegeriyane Sibayê û hîna veger dewamdike.

**'Warê kesekî nabe ji kesekî re'**

Welatiyê binavê Dawid Silêman ê ji Sîbayê ku ji 2020'ê de mala xwe biriya Sîbayê, nehe bi alîkariya Rêxistina Alîkariyên Mirovî ÎOM mala xweya ku ji aliyê DAIŞ'ê ve hatibû xirakirin avadike. Silêman ji ber ku li ser malên xwe vegeriyaye kêfxweşiya xwe tîne ziman û dibêje; "Di despêka em vegeriyan ji aliyê Şaredariya Rêveberiya Xweser a Şengalê ve av û ceyran ji me re hat peydakirin. Em kêfxweşin ku li ser malên xwe vegeriyane, rewşa ewlekarî ya herêmê başe. Em dixwazin malbatên din jî vegerin ser malên xwe. Eger gel vegera ewê warê me ji nûve ava bibe. Heya dinê cihê kesekî nabe ji kesekî re. Şengal cihê me ye û pêwîste em lê xwedî derkevin. Avabûna warên me wê bi vegera gel pêk were. Bila gel vegere ji bo alîkariya wan jî bêkirin." - ***ROJNEWS***





# Li Rojhilatê Kurdistanê di xwepêşandanan de 5 kes hatin qetilkirin

Xwepêşandanên ji bo şermezarkirina Kuştina Jîna Emînî ku li Rojhilatê Kurdistanê daketin kolanan, rastî êrişên hêzên dewleta Îranê hatin û di encamê de 5 kes hatin qetilkirin

**Navenda Nûçeyan /Qamişlo**

Piştî kuştina jina Kurd Jîna Emînî ya 22 salî ji aliyê Polîsên Exlaqê yên îranê li Tehranê, xwepêşandanên şermezarkirinê li gelek bajarên Rojhilatê Kurdistanê destpê kirin û dewam dikin.

Li gorî Rêxistina Mafê Mirovan ya Kurd, di çalakiyên şermezarkirinê yên ku li gelek bajarên Rojhilatê Kurdistanê hatin lidarxistin, herî kêm 5 kesan jiyana ji dest dan û gelek kes jî birîndar bûn.

Li gorî agahiyên ku li ser medyayên civakî hatine belav kirin, li bajarê Seqizê 2 kes, li Dîwandereyê 2 kes, li Dehgulanê jî kesekî jiyana



xwe ji dest dan.

Her wiha li gel van her sê bajaran û bajarên Mahabad, Bûkan, Ûrmiye, Sine, Kamyaran, Bicar, Qurwe Banen û gelek bajarên din, bi dehan kes birîndar bûn. Li gorî hin çavkaniyên xwecihî nêzî 100 kesî birîndar bûne.

Çalakiyên şermezarkirinê li bajarên Îranê jî belav bûn. Li Tehran û Meşedê, her wiha li zanîngehan çalakî pêk hatin û li dijî hikumetê dirûşm hatin qîrîn. Li navenda Tehranê roja Duşemê bi sedan kes daketin qadan, polîsan jî li dijî xwepêşandêran ço û gazên çavan dişewitînin bi kar anîn. Hate ragihandin ku gelek çalakger hatine destgîrkirin.

Di 13'yê îlonê de Polîsên Exlaqê yên dewleta Îranê Jîna Emînî li paytext Tehranê, li cihê derketina ji metroyê destgîr kiribûn û işkencekiribûn. 16'ê Îlonê Emînî li nexweşxaneyê jiyana xwe ji dest dabû, piştre cenazeyê wê li bajarên Seqizê yê Rojhilatê Kurdistanê li Goristana Ayçî hatibû veşartin. Çalakiyên şermezarkirinê jî piştî veşartina cenazeyê Jîna Emînî destpê kirin.

# Gerîlayên azadiyê 16 dagirker ceza kirin

**Navenda Nûçeyan /Qamişlo**

**HPG'ê diyar kir ku di çalakiyên gerîla de yên 19 û 20'ê Îlonê 16 dagirker hatine cezakirin û wesayiteke leşkerî ya bi tîpa kîrpî û droneyek hatin îmhakirin.**




Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê bi daxuyaniyek diyar kir ku di çalakiyên hêzên wan de 16 dagirker hatin cezakirin ku 3 ji wan kontra bûn. Herwiha da xuyakirin ku wesayiteke leşkerî ya bi tîpa kîrpî û droneyek hatin îmhakirin.

HPG'ê ragehand ku li Geverê di şer de hevrêyên wan Eylem û Evîn yê bi ruhê Apoyî û lehengî şer kirin, şehîd bûn.

HPG'ê da xuyakirin ku artêşa Tirk a dagirker Qadên Berxwedanê 23 caran bi bombeyên qedexekirî, çekên kîmyewî û gazên îsotê, 9 caran bi balafirên şer, 68 caran bi helîkopterên êrîşê, bi dehan caran jî bi obus, hawan û çekên giran bombe kir.

HPG'ê da zanîn ku di 19'yê Îlonê de Îlonê de saet di li Qada Berxwedanê ya Çemço, tîmên wan yên bi tevger, komek ji dagirkeran xistin bin kontrola xwe û bi sûîqestê lê dan. Di vê çalakiyê de dagirkerek hate cezakirin. Herwiha da xuyakirin di 20'ê Îlonê de li Qada Berxwedanê ya Sacayê, tîmên wan yên bi tevger bi çekên giran li dagirkeran xistin û dagirkerek hate cezakirin.

HPG'ê da xuyakirin ku di 20'ê Îlonê li Qada Girê Şehîd Şahan a Xakurkê, tîmên wan yên bi tevger, bi çekên giran li wesayiteke leşkerî xistin, wesayita leşkerî bi îmha bû, 10 dagirkerên tê de hatin cezakirin. Herwiha di 20'ê Îlonê li Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî, tîmên wan yên bi tevger li dagirkeran xistin û dagirkerek hate cezakirin.

HPG'ê da zanîn ku 19 'yê Îlonê, li herêma navbera gundên Kapotê, Yekmalê û Darê yên navçeya Geverê ya Colemêrgê, di navbera du hevrêyên me û artêşa Tirk a dagirker de şer qewimî. Di vî şerî de 3 kontra hatin cezakirin. Herwiha da xuyakirin ku hevrêyên wan Eylem û Evîn şehîd bûn.

# PYD: Hêza me ya xweser mîsogeriya serkeftinê ye

**Navenda Nûçeyan /Qamişlo**

**PYDê diyar kir ku ew di wê baweriyê de ne ku hêza wan ya xweser têrê dike ku serkeftinê mîsoger bike û got, em soz didin ku layîqî fedakariya gelê xwe bin.**

Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) bi boneya salvegera 19 wwemîn a damezirandina xwe, peyamek weşand.

PYD'ê di peyama xwe de diyar kir ku ê têkoşînê dewam bikin heta ku armancên ku em ji bo wê tê dikoşînin, anku mîsogeriya mafên gelê Kurd û avakirina Sûriyeke demokratîk, mîsoger bikin û wiha got: "Partiya me li ser daxwaza gelê me ya têkoşîna ji bo çareserkirina pirsgirêka kurdî û misogeriya mafên wî yên rewa li Sûriyê hat avakirin. Partiya me xwe dispêre rêgeza neteweya demokratîk a ku hemû cureyên neteweperest, olperestî û zayendperestî red dike û ji bo ku ev armanc pêk werin, gelek fedakarî dan û roleke pêşeng di xurtkirina jiyana aşatiyane di navbera pêkhateyan de lîst."

PYD'ê da xuyakirin ku partiya wa ji destpêkê û heta niha, partiyeke rizgariyê ye û wiha dewam kir: "Di pêşxistina sîstema hevserokatiyê de û pêkanîna wekheviya zayendî di rêziknameya xwe de pêşeng bû. Me şerê hemû cûre tundiya li ser jinan û hemû cûreyên qirkirina jinan kir. Em teqez dikin ku em ê têkoşîna xwe dewam bikin û hemû hewldanên xwe bikin heta ku azadî û wekheviya zayendî pêk were, ji ber ku em vê yekê bawer in ku jina azad a rêxistinkirî mîsogeriya civakeke demokratîk e."

Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) da zanîn ku çawa wan di mercên herî zehmet derbas kirin, ew ê di merheleyên bê de jî derbas bikin û wiha qedand: "Em careke din soz didin ku em ê kar bikin ku li gorî baweriya ku gel daye me bin û layîqî fedakariyên wê be. Em di wê baweriyê de ne ku hêza me ya xweser têrê dike ku serkeftinê mîsoger bike, divê em bi vîn û îsareke xurt di vê rêyê de dewam bikin."

# Rûken: Îran, wê bi têkoşîna azadiyê ya jinan azad bibe

Zerîn Rûken diyar kir ku rejîma Îranê bi êrîşa li dijî hêviya azadiyê ya jinan hewl dide ku mejî û ruhê wan teslîm bigire û got, wê azadî bi hêza rêxistinî ya jinan bê Îranê.

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

Endama Konseya Rêveber a KJK'ê Zerîn Rûken li ser komkujiyên ku dewleta Îranê li jinan dike, ji Ajansa ANF'ê re axivî.

Zerîn Rûken diyar kir ku li Rojhilatê Kurdistanê-Îranê komkujiya jinê, destavêtin, nixumandina jinê, şerê qirkirina jinê yên li hemberî şoreşa jinê tê kirin, di heman demê de şerekî îdeolojîk e û got, Ev şerê îdeolojîk, êrîşeke plankirî ya stratejîk a moderniteya kapîtalîst e ku, di nava civakê, siyasetê, aboriyê, xwezayê, çand, hunerê, medyayê, perwerdeyê li dijî jinê dike. Radixe pêş çavan ku zayendîperestiya civakî gihîştiye asta herî bilind. Li Îranê jin li dijî vî mejiyî êdî li ber xwe didin. Dem ew dem e ku bi piştevaniya jinê, em hîn bi pêş ve biçin, rêxistiniya hevpar bikin.



**'Divê gelên Îranê çalakiyên xwe xurt bikin û hesab bixwazin '**

Zerîn Rûken da xuyakirin ku têkoşîna jinê ya li Kurdistanê bi dirûşma 'Jin, jiyan, azadî' bûye xwedî nasnameyekê û wiha got: "Ev dirûşm êdî li tevahiya cîhanê bûye qîrîneke jiyana azad. Li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê, di meşên ji bo Jîna Emînî de mêr û jinan ev qîrîna azadiyê bilind kirin. Hêza 'Jin, jiyan, azadî' derseke mezin daye dewleta mêtinger. Gelên Îranî hemû divê li dora vê dirûşmê daxwaz û çareseriyê biafirînin û çalakiyên xwe hîn mezintir dewam bikin."

Zerîn Rûken destnîşan kir ku dem hatiye mejiyê bi kuştina jinê, girtin, zext û komkujiyan dixwaze jinan bitepisîne bê rawestandin û got, Rejîma Îranê bi êrîşa li ser jinên têkoşer dixwaze civakê teslîm bigire. Her wiha bi êrîşa li dijî hêviya azadiyê ya jinan hewl dide ku mejî û ruhê wan teslîm bigire. Vê destavêtinê li jinên Îranî hemûyan ferz dike, rewa dike. Êrîşa bi hinceta hîcapê, peyameke. Divê bi xweparastinê hesab bê pirsîn.

**'Îran wê bi têkoşîna azadiyê ya jinan azad bibe'**

Endama Konseya Rêveber a KJK'ê Zerîn Rûken destnîşan kir ku têkoşîna jinê ya li Îranê û Rojhilat gihîştiye asta têkoşîneke xurt û wiha got: "Li dijî rejîma Îranê ya mêtinger û dijminê jinan, li dijî vî mejiyê ku wezîfedarên dewletê yên taybet diparêze, îro gelê me li her devera Îranê û Rojhilat rabûye serhildanê. Azadî wê bi hêza rêxistinî ya jinan bê Îranê. Em sekna serhildanê silav dikin. Îran wê bi têkoşîna azadiyê ya jinan azad bibe."

# 'Dewleta tirk wê hesabek pir mezin bide'

**Şaho Gabar/ Qamişlo**

**Ebla Xelîl diyar kir ku Rêber Apo ji bo gelan hêviya azadiyê û jiyana demokratîk e û got, fikrê Rêbertî ne tenê ji bo gelê Kurd, wê ji bo tevaiya gelan, azadiyê bîne. Ji ber wê ji deweta tirk re hesabek pir mezin bê xwastin.**

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji sala 1999'an ve bi kompoloyeke navneteweyî hat girtin û li Girtîgeha Tîpa F ya li girava Îmraliyê di bin çavdêrî û di nava tecrîdeke pir tund û giran de dîl hatiye girtin. Roj bi roj tecrîda li ser wî hat girankirin, mafê herî xwezayî yê her girtiyeke asayî ku hevdîtina bi malbat û parêzerane jî, bi hêcetên bê bingeh tê bipêkirin.`

Herî dawî di 25'ê Adara 2021'an de bi birayê xwe Mehmet Ocalan re bi rêya telefonê hevdîtinek pêk aniye ku ew hevdîtin jî, di niviyê de hatiye astengkirin. Parêzerên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan jî herî dawî piştî hevdîtina 7'ê Tebaxa 2019'an û heta niha hemû serlêdanên wan yên ji bo hevdîtinê, bê bersiv hatine hiştin. Her wiha tevî ku bersiv nehatiye dayin jî çendîn car cezayên kêyfî yên qedexeya hevdîtinan û tecrîdan li ser Rêber Apo tê ferzkirin.

Derbarê tecrîda li ser Rêber Apo, endama Desteya Rêveber ya Meclisa Cîbicîkar ya herêma Cizîrê Ebla Xelîl ji me re axivî.

Ebal Xelîl tecrîda girankirî ya li ser Rêber Apo şermezar kir û wiha got: "Rêber APO, Rêber û hêviya hemû netewên bindest e, lê mixabin di roja îro de ji ber tirsa ji ramanên wî, tecrîdek girankirî li ser tê maşandin. Eger îro pêkhateyên Rojava û Bakur û Rojhilatê Suriye projeya Neteweya Demokratîk pêş xistin, berhemê fikirê Rêber APO ye. Êrişên ku li ser herêmên Pa-



rastina Medya, Şingal û Rojavayê Kurdistanê tên kirin, tev girêdayî tecrîda li ser Rêbertiyê ne."

**'Dewleta tirk wê hesabek pir mezin bide'**

Ebal da zanîn ku Rêber Apo ne tenê ji bo gelê Kurd, ji bo hemû gelan Rêberê azadiyê ye û wiha got : "Rêber Apo ji bo gelan hêviya azadiyê û jiyana demokratîk û hevpar e. Tecrîda ku li ser Rêber Apo tê kirin, tê wateya êrîşa li hember paşeroja azad ya gelan. Dewleta Tirk a dagirker bila bizanibe her ku tecrîda li ser Rêber Apo giran bike, wê berdêlê wê giran be. Dewleta tirk dixwaze bi tecrîdê pêşiya têkçûn û tunebûna xwe bigre. Lê bila bizanin ku ne tenê desthilatariya xwe, wê her tiştên xwe jî winda bikin, wê bin bikevin û di bin de bimînin."

Ebla da xuyakirin ku felsefeya jiyana azad û paradigmaya civaka demokratîk ku ji aliyê Rêber Apo ve hatiye danîn her diçe ji aliyên hemû gelan ve tê pejirandin û axaftina xwe wiha domand: "Fikir û felsefeya Rêber Apo ne tenê ji gelê Kurd re, wê ji hemû gelan re azadiyê bîne. Wê projeya Neyeweya Demokratîk li tevayiya Rojhilata navîn belav bibe, hewldanên dew-



leta tirk ya dagîrker ya pêşîgirtina li ber fikir û felsefeya Rêber Apo jî, wê têk biçin."

**'Armanca tecrîdê pêşîgirtina li fikrê azade'**

Ebal diyar kir ku armanca tecrîda ku dewleta Tirk dide meşandin pêşîgirtina li ber fikrên Rêber Apo ye û wiha got: "Dewleta Tirk dixweza Rêber Apo ji gelî wî û ji tevahî cîhanê qut bike. bi vê yekê hewl didin pêşî li ber Raman û felsefeya Rêber Apo bigirin. Ji ber ku felsefeya Serok Apo felsefeyekî demokrat û aştiyane ye û mifteya çareseriyên pirsgirêkên herêmê ye."

Endama Desteya Rêveber ya Meclisa Cîbcîkar ya herêma Cizîrê Ebla Xelîl axaftina xwe wiha qedand: "Em bang li hemû mirovahî û kesên aştîxwez dikin ku dengê xwe li dijî tecrîde li ser Îmraliyê bilind bikin, da ku ev sucê bê mirovahî bi dawî bibe. Herwiha bang gelê Kurd dikin ji bo azadiya Rêber Apo ya fîzîkî têkoşînê bilind bikin"



## Ji bo tinekirina DAIŞ'ê, divê hesab ji AKP'ê bê xwestin

**DILYAR CIZÎRÎ**

Kampa Holê yek ji cihên herî metirsîdar ên DAIŞ'ê nifşekî nû tê de amade dike. Di vê kampê de jinên DAIŞ'ê yên ji gelek welatên cîhanê bi hemû rê û rêbazan hewl didin zarokan zêde bikin. Wan perwede bikin û nifşa nû amade bikin.

Li gorî belgeyan ji bo wê jî şaneyên veşartî yên DAIŞ'ê bi hemû rêbazan kesên li dijî vê plana wan ba dikuştin. Di nava vê salê de herî kêm 44 kes bi awayekî hovane hatin kuştin.

Hêzên Ewlekariya Hindirîn a Bakur û Rojhilatê Sûriyê dema metirsî feriq kirin opersyona Mirovî û Ewlehiyê, dan destpêkirin. Di opersyona 24 rojan dewam kir de, 226 çete di nav de 36 jin bûn, hatin girtin. Her wiha miqdarek çek, çebilxane û her wekî din jî hatin desteserkirin. Di heman demê de gelek tûnel û cihên perwedeyê hatin rakirin. Dema mirov encama opersyonê dibînin baş feriq bike di kampê de çeteyên DAIŞ'ê çi dikirin. Tişta herî xeter jî sîstema wan a perwedeyê û afirandina nifşekî nû ye. Hêzên QSD'ê û Rêveberiya Xweser piştî êrişa girtîgeha Sîna ya Hesekê biryar dabû pêngava duyemîn a opersyona Mirovî û ewlehiyê daba destpêkirin. Lê ji ber êrişên dewleta Tirk a dagirker li ser xeta sînor û hedefgirtina bi balafirên bê mirov, opersyon hate paşdexistin.

Lê ji ber Rêveberiya Xweser xeteriya kampê feriq kir, tevî hemû şert û mercên heyî û êrişên dewleta Tirk opersyon hate destpêkirin û 24 rojan dewam kir. Koalîsyona Navdewletî ya li dijî DAIŞ'ê jî dema encamên opersyonê yên rojê ndestpêkê dîtin, ket navberê û piştgirî da opersyonê.

Di vê opersyonê de jî careke din gelek belgeyên piştgiriya dewleta Tirk û xwedîkirina wê ji DAIŞ'ê re derkete hole. Ji ber wê jî, roja Hêzên Ewlekariya Hundirîn, bidawîkirina pêngava duyemîn a Opersyona Mirovî û Ewlehiyê ragihand, dewleta Tirk roja din êrişî herêmên sînor ên Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir. Bi vê jî aciziya xwe ya têkçûyîna plana wan a di kampê de û têkçûyîna xetên ji DAIŞ'ê dihatin vekirin re, anî ziman. Rayedarên wan, dîn û har bûn.

Lê ev têkçûyîna DAIŞ'ê di Holê de, gaveke din li rêzetêkçûnên dewleta Tirk ên di hermê de ku bi opersyona Sondê ya li dijî sîxur û ajanan, her wiha têkçûyîna DAIŞ'ê ya di girtîgeha Sîna ya Hesekê de zêde kiriye. Ev hemû derbeyên li dijî siyasetên dewleta Tirk ên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ne. Di heman demê de serkeftinên xelkên Bakur û rojhilatê Sûriyê ye.

Tişta balkêş jî heta niha ne Amerîka û ne jî welatên din ên Koalîsyona navdewletî ya li dijî DAIŞ'ê yên li kampa Holê tevî daxuyaniya serkeftina Opersyona Mirovî û Ewlehiyê dan û piştgiriya xwe ya bi QSD'ê re anîn ziman jî, çavên xwe ji piştgiriya dewleta tirk a bi DAIŞ'ê re girtine û naxwazin vê piştgiriyê bibînin. Ji ber wê jî, hîn ji bo berjewendiyên xwe naxwazin bêjin, ji bo tunekirina DAIŞ'ê, divê hesab ji hikûmeta AKP'ê bê xwastin û rê li pêşiya wê nagirin. Heger ev ne be wê tunekirina DAIŞ'ê li Iraq û Sûriyê ne pêkan be.



# Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê sala xwendinê ya 2022-2023`yan dest pê kir

**Navenda Nûçeyan**

Roja 18'ê Îlonê dibistanên Bakur û Rojhilatê Sûriyê deriyên xwe li pêş xwendekaran vekirin ku dest bi sala nû (2022-2023) ya xwendinê bikin.

18'ê Îlonê Roja yekemîn a dewama dibistanên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yên Helebê dest pê kir. Ligel wê jî li ser paşxistina dema destpêkirina sala xwendinê li herêma Firatê ji ber topbarana dewleta Tirk a dagirker, metirsî hene.

**Sala Xwendinê 30`ê Tebaxê, Dewama Xwendevana 18`ê Îlonê destpê kir**

Desteya Perwerdeyê ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê di 30'yê Tebaxê de destpêkirina sala xwendinê ya 2022-2023'yan ragihandibû û eşkere kiribû ku 11'ê Îlonê roja yekemîn a dewama îdarî ye û 18'ê Îlonê jî roja yekemîn a dewama xwendekaran e.

Li gorî daneyên Desteya Perwerde û Fêrkirinê, 4 hezar û 700 dibistan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê amade ne ku pêşwaziya 878 hezar



xwendekarên qonaxên seretayî, navîn û amadehî bikin.

Her wiha 61 hezar mamoste ji bo perwerdeyê di dewreyên perwerdeya havînê re yên li ser meteryal û rêbazên danûstandina bi xwendekaran re derbas bûn.

Xwendekar bi 3 zimanan perwerdeyê dibînin; erebî, kurdî û suryanî. Lê îsal waneyên êzdayetî û îslamê derbasî dibistanan bûn. Hemwextî wê amadekirina waneyên ola xiristiyantiyê jî tê kirin.

**Tevî mercên zehmet amadekariyên vekirina dibistanan hatin temam kirin**

Bi destpêkirina sala xwendinê desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Herêma Cizîrê pêwîstiyên dibistanê li 6 hezar xwendekarên kampên



koçberên Serêkaniyê yên li bajarê Hesekê belav kirin.

Hevseroka Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Herêma Cizîrê Rohat Xelîl çavdêriya xebatên belavkirinê kir. Pêwîstiyên ku hatine belavkirin jî ji pênûs, lênûs û rengan pêk dihat.

Tevî mercên zehmet û êrişên dewleta Tirk a dagirker û rewşa awarte ya ku Rêveberiya Xweser ragihandiye, lê proseya perwerdeyê dewam dike.

**'5 hezar û 596 xwendekar ji ber êriş û topbarana dewleta tirk ji xwandinê bêpar in'**

Hejayî gotinêye ku li navçeyên Til Temir û Zirganê 3 hezar û 596 xwendekar ji xwendinê mehrûm in. Li navçeya Eyn Îsayê û gundewarên Girê Spî jî 2 hezar xwendekar ji perwerdeyê bêpar in. Li navçeya Şêrwayê 3 hezar xwendekar li 14 dibistanan tên belavkirin hema bêje ji xwendinê bêpar in. Ev xwendekar ji ber top û moşekên dagirkeriya Tirk û çeteyên wê li ser gund û dibistanan ji xwendinê bêpar in.

Çavkanî ***ANHA***

# Erdogan, ji bo Kurdan li cîhanê digere

**Zekî BEDRAN**

Erdogan, piştî zîrveya Şanghayê hilma xwe di Netewên Yekbûyî (NY) de, da. Heger li wir jî bikaribe, wê hewl bide derfeta hevdîtina bi serokê DYE Biden re bigire. Armanca esasî ya hevdîtinê jî ewe ku di şerê li hemberî Kurdan de, hîn zêdetir piştgiriyê bixwaze. Heger karibaye bi Kurdên li Tirkiyê dijîn li hev hatiba, pêwîstî bezînê, mesrefên mezin û van tawîzan nedima. Derfetê wê hebûn. Bi Îmraliyê re hevdîtin çêbû, şer hat sekinandin. Lê, Erdogan jiberkirina dewletê xera nekir. Di encamê de înkarkirina Kurd û tepisandina lêgerîna mafxwestinê, bijart. Ango, ji bo qirkirin pêk bê wek gayê dîn baz dide û êrişê her cihî dike.

Dibêje, bila serokê DYE ji bo şerê li dijî PKK'ê û YPG'ê hîn zêdetir piştgiriyê bide me. Jixwe DYE di mijara PKK'ê de, ev 40 salan zêdetire piştgiriyê dide wî. PKK xistiye lîsteya terorê. NATO jî di her astê de piştgirî daye dewleta Tirk û bûye aliyê şer. Ger wisa nebûya, sekreterê NATO'yê ew qas vekirî piştgiriyê nedida êrîşên faşîzma Erdogan yên li ser Iraq û Suriyê û operasyonên dagirkirinê. Dema Stoltenberg devê xwe vedike, hema dibêje "Em metirsiya ewlekariyê ya Tirkiyê fêm dikin, Tirkiyê êşa terorê pir kişand." Stoltenberg rojekî di mijara parastin û ewlekariya Kurdan de negot, 'em metirsiya wan fêm dikin'. Heger piştgiriya NATO û DYE nebaya, Tirkiyê nikaribû 40 salan vî şerî bidomîne û niha piskirik jî, ji zû ve hatibû çareserkirin. DYE û NATO, dema piştgiriya dewleta Tirk dike, vî şerî fînans dike û dihêle ev şere bidome, qey ev ji bo berjewendiya gelê Tirkiyê ye?

Erdogan ji bo Kurdan cîhanê digere. Ji zîrveya Madrîd a NATO'yê şunda, diçe Soçî û li wir jî berê xwe dide zirveya Şanghayê. Niha jî dixwaze bi Biden re hevdîtinê çêbike û li ser Kurdan bazarî bike. Li Şanghayê dibêje, 'pêwîstî pênaseyeke hevpar a terorê heye'. Dixwaze bi rengekî, Kurdan bavêje derveyî cîhanê. Jixwe Kurd ne endamê ti saziyên navnetewî ne. Nav û hebûna wan tûne hatiye hesibandin û hatine înkarkirin. Lê Kurdan vê înkarê û avêtina derveyî dîrokê nepejirandin, xwe birêxistin kirin û berxwe dan. Êdî pirsgirêka Kurd gihaye asta ku bê dîtin. Ji ber vê, Erdogan dixwaze dîsa Kurdan tune bike, ji bo qirkirinê bibe encamê çi ji destê wî hebe dike. Erdogan dide xuyakirin ku wan li hemberî Kurdan bi bîryardarî têkoşîn kirinê û weke pîvana serkeftinê xwe jî, ji 2015'an wir ve kuştina bi deh hezaran dide pêş. Dibêje; li kuderê derveyî welat, dibe bila bibe emê wan tune bikin. Li Iraqê bi dehan baregeh çêkirin e. Havîn û zivistanê, çiya û keviran bombebaran dikin. Heremên girîng yên Suriyê hatine dagirkirin. Heger piştgiriya DYE û NATO'yê nebe nikarin bikin. Lê, ji ber ku bi van piştgiriyan jî, encamê ku dixwest bi dest nexist, niha jî hewl dide piştgiriya hêzên mîna Rusya û Çînê jî bigire. Tevî vê jî, dîsa dibeze li gel Biden!

Teybet gotina, 'YPG bixe lîsteya terorê' li Biden ferz dike. YPG û QSD jî hevparê koalîsyona navnetewî ya ku DYE jî di navde ye. Di şerê li hemberî DAÎŞ'ê de YPG û QSD bi dehhezaran şehîd û birîndar da ne. DAÎŞ têk birin û ji ewlekariya cîhanê re alîkariyeke mezin pêşkeş kirin. Erdogan vane hemûyan tûne dihesibîne û dibêje, hûn ê serê YPG ango Kurdan bidin min. Ji ber ku Kurdan bi Ereban û gelên din ên heremê re projeya hevpar, demokratîk û jiyanî avakirin e. Weke berhemê vê projeyê jî di heremên rizgarkirin de, gel rêveberiya xwe ya xweser avakir û xwe bi rêve dibe. Ev ji herkesî zêdetir Erdogan û faşîzma Tirk, dîn dike. Dixwaze demildest Kurd û destkeftiyên wan ji holê rabike. Ji ber DYE têkiliyê xwe bi YPG û QSD'ê re qut nekiriye, weke piştgir û hevkarê terorê tewanbar dike. Xem û fikara wan a li ser ewlekariya Suriyê û aramiya heremê tûne ye. Wê DAIŞ çi bibe? Bi dehhezaran zêdetir girtiyê DAÎŞ hene. Heger DYE destê xwe bikişîne û YPG, QSD nebe û ev çeteyên DAIŞ'ê serbest bimînin, wê herêm bikeve çi rewşê? Ji bo Erdogan girîngiya vê tiştê tûne ye. Jixwe ji bo Talîbanî gotibû, 'em xwedî nirxên hevpar in'! Tê zanîn, bi DAIŞ'ê re jî di heman hişmendiyê de ne. Îro di cîhanê de, ji bo DAIŞ'ê cihên herî bi ewle, li herêmên Suriyê yên di bin dagirkeriya Tirkiyê de ne. Di heman demê de DAIŞ di nav Tirkiyê jî dikare, xwe bi cîh bike û karê xwe bimeşîne. Di cîhanê de cihên ku Îxvanî kom bûne jî, Tirkiyê ye. Ji bilî Tirkiyê kîjan dewletên Ereb, Îxvanan di vê astê de xwedî dike an jî piştgirî dide? Qasî ku dişopînin û dibînin piraniya dewletên Ereban, dixwazin ji Îxvanan xelas bibin. Tirkiyê, demeke dirêj van çeteyan li hemberî welatên Ereban jî weke tehdîdekî bikartîne. Niha jî weke firsendeya bazarî di destê xwe de digire.

Erdogan ne tenê ji bo Rojhilata Navîn, ji bo cîhanê jî bûye tehdîdekî. Ti quralên hiqûq û exlaqê nas nake. Ji bo wê hêzên mîna DYE, Rusya, NATO û Şanghayê weke hêzên amûrê karanînê ne. Di encamê de bi navê maf, zagon û adaletê, ti fikar û rêgezên mirovî li cem wê tûne ne. Ev hêzêne şerê berjewendiyên xwe dikin. Çawa ji kesekî mîna Erdogan ku ji bo cîhanê gihaştiye asta xeteriyê, derfet jê re tê dayîn ku ew qas cîhanê bigere?